## 5. Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê

**Sedat Ulugana**

### Destpêk

Dengbêjê kurd Evdalê Zeynikê di navbera salên 1800î û 1913yan de jiyaye. Di dema xwe de dengbêjê kurdan ê herî navdar bûye. Erdnigariya Evdal, derdora Elejgir, Qereyazî, Panos û Milazgir e. Lê ji ber ku dengbêjê Surmelî Memed Paşa bûye, li hin deverên wek Erzirom, Diyarbekir, Xozan û Entabê jî geriyaye. Tê zanîn ku mijarên kilamên Evdal bi piranî li ser serpêhatiyên wî ne. Di dema xwe de tu dengbêjekî nikaribiye pê re bikeve pêşbaziya stranbêjiyê. Nav û dengê wî li hemû deverên Kurdistanê belav bûye. Wisan e ku niha jî di nav kurdan de wekî "Homerosê Kurdan" tê zanîn. Stranên Evdal, li ser gelek dengbêjan bandor kiriye û gelek dengbêjên kurd bi awayê wî strîne. Bi vî awayî tradîsyonek çê bûye. Kilamên wî bi taybetî ji aliyê dengbêjên Serhedê ve îro jî tên gotin. Duajoyên vê tradîsyonê yên herî bihêz Dengbêj Reso û Şakiro ne. Di vê xebatê de stranên Evdal ên ji aliyê Reso û Şakiro ve hatine gotin, bûne mijara vekolînê.



Scanned by CamScanner

## 1.Di Nava Kurdan de Dengbêjî û Tradîsyona Evdalê Zeynikê

Edebiyata kurdî ya devkî ji edebiyata kurdî ya nivîskî zêdetir belav bûye. Sedema vê yekê jî, an gorî hin lêkolîneran; mehrûmbûna ji zanîsta modern û jiyana wan a koçberî ye.[1] Yên ku edebiyata kurdî ya devkî pêş xistine û parastine jî dengbêj bixwe ne. Ji bilî vê mîsyoneke wan a din jî heye ku wan edebiyata kurdî ya devkî heya roja îro anîne. Pêşiya her tiştî di nava edebiyata kurdî de mînakên folklorîk pir zêde ne.[2] Girîngiya folklorê rasterast bi dengbêjiyê ve heye ku heya niha dengbêjên kurdan, mînakên folklorê gihandine dema me. Dengbêjiya kurdî xwedî dîrokeke kevn e. Di serdema mîrektiyên kurdan de tê zanîn ku cihê dengbêjan di nav cîvakê de pir girîng bû. Mirov dikare bibêje ku her mîr xwediyê dengbêjekî bi nav û deng bû.Wek her deverên Kurdistanê ji Serhedê jî dengbêjên binavûdeng derketine. Tê zanîn ku ji van dengbêjan ê herî xurt û binavûdeng Evdalê Zeynikê ye. Wek Yaşar Kemal, Ehmed Aras, Mehmed Uzun gelek lêkolînerên ku behsa Evdal kirine ew wek “Homerosê kurdan” bi nav kirine. Dema ku em dengbêjiyê jî aliyê tradîsyonê binirxînin gelo hostayê Evdalê Zeynikê kî bû? Ji bêjeya “hostetiyê” qesda me, “bandorkirin” û “terz” e. Her dengbêjek li ber destê dengbêjekî hoste rabûye. Lê ev hostetî ne wek mamostetiyê ye. Hewce ye ku ew dengbêjê hoste, ji Evdal xurtir bûbûya. Dema mirov ku vê xalê difikire, mirov îcar dikare bibêje ku “dawiya vê xalê nîne.” Piştî Evdalê Zeynikê, Gulêya Fileh, Ferzê û Reso derdikevin pêşiya me. Tê zanîn ku Gulêya Fileh, hem hevalê Evdal bû, hem jî reqîba Evdal bû. Filehbûyina wê ji bo wê avantajeke mezin bû ku dikaribû di cimaetên mêran de kilaman bibêje. Em ji serpêhatiyên Evdal Xan ên ku di kilamên wî de weşartînê hîn dibin ku Gulê demekê şûn de hostatiya Evdal qebûl dike. Li gor hin çavkaniyan di navbera Evdal û Gulê de evînek heye lê em rastiya vê yekê nizanin.

Piştî Gulêya Fileh, Ferzê dûajoyekî tradîsyonê ye ku li hêla Milazgirê jiyaye. Di salên 1960î de di dawetekê de hatiye kuştin. Di nav

1 Joyce Blau, *Contes Kurdes, ed. Flauve et Flamme*, Paris,1986, r.19.
2 Bazil Nikitin, *Kürtler*, Özgürlük Yolu Yay,1986, r.445.



Scanned by CamScanner

gel de jê re “Çûro” digotin.

Dengbêj Reso jî dîsa bi terzê Evdalê Zeynikê kilam gotine. Reso dema hê zarok bûye, Evdal dimire. Apê Reso yê bi navê Evdo jî wê demê de, dengbêjekî meşhûr bûye. Malên wan li Îdirê bûne. Gulêya Fileh her dem hatiye û çûye mala Evdo û li wir di cimaetan de herduyan kilam gotine ku bêguman piraniya van kilaman jî yên Evdal bûn. Reso di van cimaetan de hem guhdar bûye, hem jî kilambêj. Vê yekê lawê Reso yê bi navê Ebdilkerîm jî diperijîne.

Piştî Reso, mirov dikare bibêje ku xeleqa dawî ya vê tradîsyonê, dengbêj Şakiro ye. Şakiro herî zêde di bin bandora dengbêj Reso de dimîne. Em baş dizanin ku wî ji Reso pir kilam girtine ku di ferbûna hin kilaman de, Reso jê re bûye alîkar. Mirov dikare bibêje ku Şakiro piraniya kilamên Evdalê Zeynikê ji Reso girtine.

Ji bilî van dengbêjên wek Dengbêj Ebdo, Kawîs Milanî, Feqyê Qizqapanê, Emerê Zeynikê, Mihemedê Zibêd, Pêroyê Têxûtê, Zibêdê Qirka, Mistefayê Çiftborî, Şeroyê Biro, Hecî Sêvdînê Remedana, Soska Simo, Zibêdê Emo, Karabêtê Xaço, Kazoyê Garisya, Mihemedê Canşa, Evdilrehmanê Milazgirê, Zahiro, Sadiqoyê Qirimqayê, Sidîqo, Mexsûdê Hemzika, Dengbêj Ewrehmanê Panosê, Keremê Kor, Mistefayê Xelê Heyran,[1] Dengbêj Kemal (Încesû), Dengbêj Cesîm (Agirî) bi meqamê Evdal kilam gotine. Alazkirina me ya bi peyva “tradîsyona Evdalê Zeynikê” ev e; dengbêjên ku bi terzê Evdalê Zeynikê kilam gotine û kilamên wî gihandine roja me. Ji ber vê yekê jî em ê li gorî vê rêbazê, zincîrên vê tradîsyonê wiha rêz bikin: “Evdalê Zeynikê, Gulêya Fileh, Ferzê, Dengbêj Reso û Şakiro.

## 2. Evdalê Zeynikê û duajoyên wî

### 2.1. Evdalê Zeynikê

Li gorî hinek lêkolînerên kurd, Evdalê Zeynikê ji destpêka salên 1800î heta dawiya vê sedsalê jiyaye.[2] Li gorî hin çavkaniyan jî Evdal,

1 Ehmed Aras, *Şairê Kurda Yê Efsanevî Evdalê Zeynikê*, Weşanên Deng, Stenbol, 1996, r.55

2 5 Aras,h.b.,r.56



Scanned by CamScanner

di sala 1913yan de miriye.[1] Mehmed Uzun jî dibêje ku ihtîmaleke mezin Evdal di salên 1800î de jiyaye.[2] Derbarê Evdalê Zeynikê de lêkolîna herî giştî û birêkûpêk Ehmed Aras kiriye. Ehmed Aras, lêkolîna xwe bi lefzê "nebiyên Evdal" dide destpêkirin. Li gor nebiyên Evdal ê bi navê Emerê Zeynikê, Hecî Beşer û Heyder; Evdal 110 an 115 an jî 105 sal emir kiriye. Ehmed Aras an gorî van texmînan dibêje ku Evdal, di serê 1800î de hatiye dinê û di sala 1913an de wefat kiriye. Ehmed Aras di dawiya pirtûka xwe de cih daye kesên ku Evdal bi çavên xwe dîtine. ji van şahidan yek jî Abdullah Öztürk e. Aras dibêje ku "min di sala 1961î de bi Öztürk re hevpeyvîn çê kir, ew wê demê 81 salî bû. Dema ku Öztürk sala 1961î de 81 salî be, wê demê 1880 de hatiye dinê. Öztürk jî dibêje ku "ez 16 an jî 17 salî bûm, ez û Evdal em li hespên xwe siyar bûn û çûn gundekî." Wê demê mirov dikare bibêje ev rêwitî di salên 1906 an jî 1907 de pêk hatiyê. Şahidekî din jî ji Milazgirê Mela Şekir e ku Aras dibêje "min pê re di sala 1966an de hevpeyvîn çê kir ku ew wê demê 77 salî bû." Wê demê Mela Şekir di sala 1889an de hatiyê dinê. Mela Şekir dibêje ku "min pê re cîrantî kir." Şahidekî din jî ji malbata Evdalê Zeynikê, nebiyê Evdal, Emerê Zeynikê ye. Ew dibêje ku min kalikê xwe dîtiye, "kalkê min sal û nîvekî an jî du salan beriya Şerê Cîhanê ya Yekem wefat kir."[3]

Evdal ji hêla Panosê ji êla Bazûkiyan e. Bazûkî jî milekî eşîreta Memaniyan e. Êla Bazûka ji Memaniyan vediqetin û diçin li gundê Panosê yê bi navê Cemalwerdiyê bi cih dibin. Evdal kurê Mistefayê Bazûkî ye. Navê diya wî Zeynê ye. Dema hê Evdal zarok bûye bavê wî dimire. Êdi Zeynê, Evdalê sêwî xwedî dike. Ji ber vê yekê, gundî dibêjnê "Evdalê Zeynikê." Şahid dibêjin ku Evdal hê zar bûye di nav mêrg û zeviyan digeriya û dengê mêş, moz û çûkan guhdar dikir. Di şevên Serhedê yên dirêj de gundiyên Cemalwerdiyê û hin gundiyên din li mala axayê gund dicivin û her şev kilam û çîrokan dibêjin. Evdal her şev li wan guhdarî dike. Heya temenê wî tê siyî, Evdal kilaman nabêje. Dema ku emrê wî siyî derbas dike, şevekê xewnekê

1 Abidin Parıltı, *Dengbêjler-Sözün Yazgısı*, İthaki Yayınları, Stenbol,2006,r.128
2 Mehmed Uzun, *Dengbêjlerim*, İthaki Yayınları, Stenbol,2006,r.47
3 Aras ev heypeyvîn di sala 1966an de çê kiriye û wê demê Emer 65 salî bûye



Scanned by CamScanner

dibîne û di xewnê de vedireşe û ji qirika wî çend hebên garis tên xwarê.[1] Piştî vê xewnê Evdal nexweş dikeve û 6 mehan di nav ciyan de dimîne. Bedena wî wek tendûrê dikele û di nav nivînan de dibe lîwe lîwa wî, jina wî Eyşê gazî gundiyan dike û dike hewar: "Werin gundîno! Evdal dimire." Gundî li ser serê Evdal kom dibin, lihefê li ser Evdal dikişînin dibînin ku Evdal distrê. Evdal wê rojê heta êvarê kilaman dibêje. Piştî vê şevê, nav û şanê Evdal di heman deverê de belav dibe. Evdal êdî hem rêncberiyê dike hem jî diçe dawetan.

Dema ku temenê Evdal nêzikî 40î dibe êdî tu dengbêjek curet nake ku hemberî Evdal kilaman bibêje. Li Elejgirê ji binemala Îshaq Paşa, Surmelî Memed Paşa hebûye, ew mîrê Kela Topraqelê bûye. Dema ku Ebdulmecîdê siltanê Osmaniyan, mîrektiyên kurdan ji holê radike (salên 1850), li hin deveran valahiya deshilatdariyê pêk tê û ji ber vê sedemê, siltan vê carê hin begên kurdan bi rutbeya paşatiyê erkdar dike. Surmelî Memed Paşa jî yek ji van erkdaran bûye. Ew ne paşayê Hemîdiyan e, lewra alayên Hemîdî sala 1889an de tên avakirin. Dengbêjeke Surmelî Memed Paşa ya bi navê Gulê bûye hebûye. Gulê keçeke Fileh bûye. Evdal Rojekê hespê xwe siyar dibe diçe Xamûrê daweteke. Wê rojê di nav sîwarên dawetê de Surmelî Memed Paşa û dengbêja wî ya jin Gulê jî li wir bûne. Gulê û Evdal sê roj û sê şevan davêjine ber hev û di dawiyê de Evdal, Gulê têk dibe. Piştî vê Evdal êdî dibe dengbêjê Surmelî Memed Paşa.

Malbata Surmelî Memed Paşa ji berê de li Bazîdê bûne. Çolak Evdî Beg û Îshaq Paşa (Qesra bi navê wî niha li Bazîdê ye) kalikê Surmelî Mehmed Paşa bûne. Vê malbatê bi caran hem bi eceman re hem bi ûrisan re ji bo osmaniyan şer kirine. Di sala 1828an de Bazîd dikeve destê ûrisan û malbata Surmelî jî tê, li Elejgirê bi cih dibe. Piştî ku Evdal dibe dengbêjê paşê, paşa gundeki bi navê Bêdir dide Evdal. Lê ji ber ku Evdal dengbêj bûye, nikaribûye li ser gundiyan hikmê axatiyê bike. Dema ku begên kurd ên derdora Serhedê ku dibihîsin Evdal bûye dengbêjê Surmelî Memed Paşa, dengbêjên

---

1 Motîfa xewnê di nav dengbêjan de berî ku bibin dengbêj motîfeke hevpar e. Heman motîf di nav "Aşık Edebiyatı' ya tirkan de jî heye. Ji bo agahiyên berfireh bnr: Umay Günay, *Aşık Tarzı Şiir Geleneği ve Rüya Motifi*, Weş. Akçağ, Ankara, 1999.



Scanned by CamScanner

xwe (ji boyî têk birina Evdal) dişînin dîwana Surmelî Memed Paşa. Yek ji van jî, dengbêjê Terxan Axayê Qeleniyê yê bi navê Şêx Silê ye.[1] Evdal û Şêx Silê bi rojan davêjine ber hev û Evdal, Şêx Silê têk dibe.

Di sala 1860an de li çiyayê Xozan/Kozanê (ku Kurd jê re dibêjin Çiyayê Sîsê) malbata Kozanoğluyan li hemberî Osmaniyan serî radikin. Li gor hin çavkaniyan, malbata Kozanoğlu kurd e.[2] Siltanê Osmaniyan jî ji Surmelî Memed Paşa re fermanekê dişîne û dibêje: "divê tu 500 şervanên bijarte kom bikî û biçî Çiyayê Kozanê." Li ser vê fermanê paşa di nav eşîrên kurdan de 500 şervanan dide hev û diçe. Jina paşê ya mezin Eyşan û rûsipiyên paşê dibêjin paşê: "Paşa! neçe Xozanê. Bextê Siltanê Romê nîne. Dewleta Osmanî hema li hêviya 500 şervanên te maye qey?" Bes ew çi dibêjin jî paşa wan guhdar nake û dikeve rê diçe Xozanê. Jina xwe ya biçûk, melayê xwe û dengbêjê xwe Evdalê Zeynikê jî bi xwe re dibe. Lê li Xozanê di Îlona 1865an de nexweşiya qolerayê di nav leşkerên kurdan de belav dibe û piraniya wan bi destê vê nexweşiyê dimirin. Dibêjin ku wê demê di Çiyayê Xozanê de marên zîha hebûne. Rojekê yek ji van marê zîha, êrîşê paşê dike û paşê dikuje.

Tê zanîn ku wê demê şairê Kozanoğluyan, şairê bi nav û deng Dadaloğlu jî li Çiyayê Xozanê bûye. Lê nediyar e ku wî û Evdalê Zeynikê li wir hev dîtine yan jî haya wan ji hev hebûye?[3] Derwîş Paşa dema kû Kozanoğluyan têk dibe û şer xilas dibe, Evdal û çend leşkerên kurd vedigerin Serhedê. Ev rêwîtiya wan pir bi zehmetî didome. Cinazê paşê û leşkerên kurd jî êdî li Çiyayê Xozanê tên hildan. Piştî mirina Surmelî Memed Paşa, li Elejgirê çerkez zora kurdan dibin û di navbera wan û kurdan de pevçûn dertê û bi dehan

1 Kemal Süphandağ, *Ağrı Direnişi ve Haydaranlılar*, Fırat Yayınları, Stenbol, 2006,r.15
"Çawa ku Kemal Süphandağ jî dibêje Terxan Axa, axayekî eşîra Heyderan bûye. Paşê qîza Elî Axayê Kok (Êzidî) direvînin û di navbera wan û Êzidiyan de şerekî dijwar diqewime. Eskerê Boyik jî vê mijarê jî erê dike."

2 Celîlê Celîl, *Kürt Halk Tarihinden 13 İlginç Yaprak*, Evrensel Basım Yayın, Stenbol,2007,r.72
"Li gor vê çavkaniyê, Suleyman Begê Xozanoxlû di sala 1888'an de di Sefîrê ûris re nameyek şandiye û gotiye " Em kurd in, ne tirk in."

3 Sedat Ulugana, Gülay Mermer, "Kozanoğulları Kürt Beyliği ve Sürmeli Mehmet Paşa", *Kovara Mizgîn*, Hejmar 60, Tebax 2009



Scanned by CamScanner

mirov dimirin. Li ser vê yekê desthilatdariya malbata Surmeliyan bi dawî dibe û Evdal jî vedigere gundê xwe.

Piştî mirina paşê, Evdal xizan dibe. Di dawiya emrê wî de çavên wî kor dibin. Tê zanîn ku Evdal di rêwîtiyekê de zarokekî ku dest jê hatiye berdan dibîne û tîne mala xwe û wî mezin dike. Navê wî zarokî jî Temo bûye. Dema çavên Evdal kor dibin, dibêjin ku Temo destên Evdal digirt û ew di nav gund de digerand. Lê Evdal dema kor bûye jî dest ji stranbêjiyê bernedaye. Çend meh şûnde li ji Îranê hekîmek tê herêma Agiriyê. Ev hekîm çavên Evdal derman dike û li ser vê dermankirinê, çavên Evdal dîsa dibînin. Di sala 1913an de Evdal nexweş dikeve û dimire. Gora wî niha li gundê Qanciya ye. Ev gund girêdayê bajaroka Qereyaziyê ya bi ser bajarê Erziromê re ye. Di sala 2012an de li wî gundî gora wî hatiye restorekirin û ji boyî wî mozole hatiye çêkirin.[1]

## 2.2. Gulêya Fileh

Di tradisyona Evdalê Zeynikê de Gulêya Fileh yekem dengbêja jin e. Çîroka wê, bi çiroka Evdalê Zeynikê ve girêdayî ye. Yanî çîroka Evdal nebûya, haya me bi çîroka Gulê jî çê nedibû. Tiştê ku em derbarê Gulê de dizanin, keça keşîşekî ermenî bûye. Berî Evdal, ew dengbêjê Surmelî Memed Paşa bûye. Piştî ku cihê xwe daye Evdal, Gulê dîsa jî di jiyana cimaetên kurdan derneketiye. Di gelek cimaetên dengbêjan de wê û Evdal kilam avêtine ber hev. Heya di van kilaman de mînakên evîniyê û erotîzmê jî hene. Evdal di van kilamên hevpar de mêrekî birik e, xwestekên xwe yên erotîk û evîniyê bi riya xwesteka guhertina olê teklîfê Gulê dike. Gulê jî wek jineke serbilind, van xwestekên Evdal qebûl nake. Di hin ciyan de jî bi zimanê xwe bersivê dide Evdal. Her çiqas tê gotin ku Gulê û Evdal bi hev re zewicîne jî, ev ne agahiyeke piştrastkirî ye. Di havîna sala 2013an de, li gundê Pagê yê li ser Mûşê, lawê Dengbêj Reso yê bi navê Ebdilkerîm çend agahiyên nû dan me ku digot: "Gulê her dem

1 Bülent Gündüz, "Evdalê Zeynikê Anıt Mezarı ve Kültür Sanat Festivali", *Yeni Özgür Politika*, 25 pûşper 2012



Scanned by CamScanner

hatiye mala me û di cimaetan de bi apê bavê min Ebdo re kilam gotine. Bi vî şekli li ser bavê min bandor çêbûye û ji wê kilamên Evdalê Zeynikê jî girtine." Em ji bilî van agahiyan derbarê jiyana Gulê de tiştekî zelal nizanin tenê kilama wê ya hevpar a ku bi Evdalê Zeynikê re gotiye, ji aliyê dengbêj Evrehmanê Panosê ve hatiye gotin. Bê guman ev kilam ji aliyê Gulê ve bi salan hatiye gotin. Naveroka kilamê serpêhatiyek e ku di navbera Gulê û Evdal de derbas bûye. Mirov dikare bibêje ku yekem hevdîtina wan di vê kilamê de veşartiye. Di kilamê de Evdal hem şair hem dengbêj e. Karwana ku Evdal jî tê de ye li Xamûrê radiweste. Evdal li vir Gulê dibîne. Evdal xortekî netevitîye. Li vir evîndarê Gulê dibe û dike ku Gulê birevîne lê Gulê vê yekê qebûl nake. Piştî heft rojan ku êdî şeva Evdal a dawî ye li Xamûrê, Gulê di xewna xwe de Hizretî Mihemed dibîne û heman şevê boxçikê xwe hildide û bi Evdal re direve ku di heman demê de dibe misilman. Ji vir şûn de mekanê wan êdî çiya û zozanên Xamûrê ne. Evdal di dawiya kilamê de ji Gulê ramûsanekê dixwaze, Gulê jî bi zimanekî ne kurdî bersivê dide Evdal û di vir de kilam jî diqede. Em nizanin Gulê çi bersiv daye Evdal. Dengbêj bi avayekî sirrî kilam qedandiye. Lê heman kilam balkêş e ku dema Gulê li ser "dînê Mûsa" sond dixwe û piştre dibe Misilman di cihekî de jî ku li ser qebra kalê xwe sond dixwe em dibînin ku navê kalê wî "Yûwan" e. Li vir şik çêdibe gelo Gulê ermenî bû yan jî cihû? Dîsa bersiva vê pirsê jî bi zelalî ne diyar e. Ev kilam derûniya Evdal û Gulê jî radixe berçavan. Evdal di peyvên xwe de erîşê şexsiyeta keç (axçik), mêr (fileh) û jinên (xars) ermeniyan (ku em gulê ermenî bihesibînin) dike. Gulê li hemberî van êrîşan, gefan li Evdal dixwe. Li gor Gulê, divê Evdal di tewlê de dewsa keran bê girêdan an jî bi destê Zeynoya diya wî li dewsa kûçikan bê girêdan Lê li hemberî van heqaretan Evdal dîsa dev ji Gulê bernade da ku bi mirazê xwe şa dibe.

> Evdal digo Gulê ca rabe destê min bigre
> Em ê herne Xamûrê lê lê lê lê lê lê vê dawetê
> Ez bala xwe didmê Gula bavfileh kerî kiriye porê xwe zer e tê vê govendê



Scanned by CamScanner

Bejn e zirav e ji qamûşê devê golê, çevn e reş e ji hibrê, poz pine ye niqulê kewê
Sura Qesewînê, hîva binê darê, bayê Sîpanê Xelatê, sura Eledaxê lê da
Awaz awaz dihejiya min dî tew lê ketê
hildaye sade ji belgê Gulê dema çavê serê xwe dî
gelî bira gazin loma ji mi nekin Bixwe berê dilê min ketê
Gulê canê Gulê canê
Erê Gula min Canê Gula min Canê Gulê Canê
Weyla xeberxweşê, yêşîlbaşê, min heyranê
(...)
Weyla Şemamoka nav bostanê
Wey bêbavê bes e lê lê wê lê lê wê xûna min kanê
Wey can Gulê wey can Gulê

Gulê vegerya go
Evdal ca were destê min bigre em ê meyl kin
Îro herne lo loo lo lo lo loo lo mala me ye
Ez ê ji te ra daynim orxan doşekê pişta wan lawo qedîfe ye
Ezê bi dest û pêçiyê xwe yê nazik çê bikim birincekî lewo bisuzme ye
Ezê te ra çêkim cotekî gorê zemanê berê, di nav Kurmanca da qîmetê giran
digotin Saqê Xirimqatlewme ye
Dema tu ji mala Gula Bavfileh vegeriyayî kîjan heval, hogir rastî te hatin
Ji te pirs kirin go îkrama Gulê ji te ra çibû
Tu wî çaxî bêje îkrama Gulê ji serê heftê yek bavê min zêde ye
Gulê Canêêê Gulê canêê
Evdal digo
Gulê wez hatim Xamûrê
lê lê lê lê lê lê lê îro hawar li bêrîka
Ez ketime nav govendê, Filah, Xarsa bedew van Axçîka
Gulê ez guh name heneka, laqirdîya min sond xwariye dê ramûsim hinarê xalê wîya
berê ewê xala bedew orta herd birîya li ber cênîka Gulê canê



Scanned by CamScanner

Gulê caneê wê ê ê canê

## 2.3.Dengbêj Ferzê

Derbarê dengbêj Ferzê de pir tişt nayên zanîn. Haya me bi saya kilama ku dengbêj Reso li ser kuştina wî gotiye çê dibe. Dengbêj Ferzê di salên 1950 an 1960î de wefat kiriye. Tarîxa jidayîkbûna Ferzê jî nayê zanîn. Dengbêj Ferzê ji gundê Kevir a Milazgira Mûşê ye. Hevalê dengbêj Reso bûye. Herduyan, di gelek dawet û cimaetan de bi hev re kilam gotine. Ku Reso digote wî "Çûro".

Rojekê li gund dawetek çê dibe û gazî Ferzê jî dikin. Dibêjin ku Zekiyê Mîralî jî wê demê qaçax bûye û ji binxetê nû ziviriyê Milazgirê. Zekî bi tevê Fesîhê Mihê Mîrze (Zekî û Fesîhê Mihê Mîrze kurapê hev in) û Seyitxan, Elican ve demekê di Serhildana Agiriyê de li hemberî dewletê şer dike. Lê dema ku serhildan têk diçe, Zekiyê Mirali û qaçaxên din bi tevahî derbasî binxetê dibin. Li hêla Mûşê Elîcan û li hêla Surgiciya Mêrdînê jî Seyîtxan tên kuştin. Lê Fesîhê Mihê Mîrze û Zekiyê Mîralî ji defikên ku aliyê cendirme û milîsan ve ji boyî wan hatine danîn xilas dibin.[1] Zekî demeke dirêj li binxetê dimîne. Di sala 1950î de ji ber derketina efûyê vedigere gundê xwe. Wê demê, li devera Milazgirê Ferzê dengbêjekî binavûdeng bûye. Roja dawetê di navbera Zekî û Ferzê de gengeşiyek derdikeve û Zekiyê Mîralî çeka xwe ji ber xwe dikişînê û Ferzê dikuje. Sedema vê kuştinê heta roja îro nayê zanîn. Hinek jî dibêjin dema bûkê ji hespê peya dikin Zekî çeka xwe dikşîne û çend guleyan diteqîne û di vê navberê de fîşengek difistiqe û li Ferzê dikeve. Li ser vê kuştinê Reso stranekî dibêje. Derbarê jiyana Ferzê de çavkanî hew ev stran e:

Xasê digo Nazê, Nazê digo Bîlnazê, Bîlnazê digo lê lê Gulnazê
Gulnazê korê ax
Korê de rabe ezê bi Milazgirê bi gundê Kevir biketima
Wê bi zeviya ketim wey wey

1 Ehmed Aras, *Serhildana Seyîdan û Berazan (Seyîtxan, Elîcan, Fesîhê Mihê Mîrze)*, Perî, Stenbol,2009, r. 34.



Scanned by CamScanner

Sibeye min dêhna xwe dayê du heb siyar derketin derê Ferzende
De şahê dengbêjan ,teyrê ser milê qîz û bûkan wîîî
De bavê Miheme Salih namekê didane destan
Digo li gundê Kevir dawet e
Keremke were kambaxa dawetê
(...)
Min dît bûk ji derê malê de hatî
Bavê Miheme Salih, Teyrê ser milê qîz û bûkan
Kilam dikote çerxa dawetê geş dikir way way way
Kula xwedê tu yê bi kulê bikevî mala Zekî Lawê Mîralî
Min dît demançekî sesagira Malnihêrî
berdaye bedena bavê Miheme Salih, Şahê dengbêjan
Mîrata gula Malnihêrê movika piştê xilas kir. Way way way.[1]

## 2.4.Resoyê Gopala

Dengbêj Reso di sala 1902yan de li gundê Kerîmbeylî yê girêdayê Îdirê ji dayîk dibe. Navê Bavê wî Welî û navê diya wî Hefsê (Hafîze) bûye. Du xwişk û çar birayên wî hebûne. Ji eşîra Bekiran bûye. Eşîra Bekiran, eşîreke devera Xerzan û Amedê ye. Eşîr di demeke dirêj de koçer bûye. Havînan li Serhedê; zivistanan jî li gundên xwe yên li devera Amed û Xerzanê jiyane. Di destpêka salên 1700î de êleke Bekiran li van deveran vediqete diçe Serhedê û heta Rewanê û nema vedigere Amedê. Di dema şerê ûris û tirkan de Bekiranên Serhedê ji hev belav belavî dibin. Malbata Reso ji ber van şeran ji Rewanê koçî Îdirê dike.

Dema ku Reso 7 an jî 8 salî ye (1909-1910) Gulêya Fileh tê Kerîmbeyliyê. Apê Reso yê bi navê Evdo jî dengbêjekî binav bûye û hem bi Evdalê Zeynikê re û hem jî Gulêya Fileh re her demî kilam gotine û di cimaeta wan de cih girtiye. Reso jî ji wî û ji Gulê kilamên Evdalê Zeynikê girtine. Bawer dikim ev xal girîng e. Ji ber ku dengbêjekî mêr ji dengbêjeke jin kilam girtine. Demeke berê min li ser mijara “Tradîsyona Evdalê Zeynikê” bi Ehmed Aras re hevpeyvînek çê kir.

---

1 Salih Kevirbirî, “Kuştina ‘Teyrê Ser Milê Qîz û Bûkan’ Dengbêj Ferzê”, *Bîrnebûn*, Hejmar 15, 2002, r.55.



Scanned by CamScanner

Tiştên ku Aras digotin pir balkêş bûn:

> Ez bawer im pêşiya Evdal, pir dengbêjên binavûdeng hebûn lê çima bi tenê haya me bi Evdal heye? Lewra jiyana Evdal pir balkêş bû. Saya serê Evdal haya me bi dengbêjekî bi navê Şêx Silê jî çê dibe. Ez dikarim tiştekî hîn balkêş jî bibêjim, mînak, ev "opera" terza xwe ji lîrîka dengbêjên Serhedê digire. Heya niha li ser Evdal tu xebat nehatibûn kirin. Demekê min bihîst ku li Êrîwanê kurdên me li ser Evdal sala 1936an de xebatek pêk anîne. Rojekê Eskerê Boyik hate Kurdistanê û ji min re ev xebat jî anî. Lê bi rastî ev xebat ne xebateke têr û baş bû. Li ser Evdal ez dikarim di dawiyê de vê bibêjim; nebiyê Evdal, Emerê Zeynikê (ku bi çavên xwe Evdal dîtiye) digot ku di nava dengbêjên kurd de herî zêde dengê Şeroyê Biro dişibiya dengê kalikê min. Te digot qey dengê herdukan wek hev in.[1]

Li gor Ehmed Aras, di navbera temenê Reso û Ferzê de demeke kurt heye. Reso li gundekî Îdirê ji dayîk dibe. Tê zanîn ku li wir Gulêya Fileh yanî Gulêya ku beriya Evdal, dengbêja Surmelî Memed Paşa bûye, emrekî dirêj li hêla Îdirê jiyaye. Dibêjin ku Reso bi piranî stran ji Gulê girtine. 27 saliya xwe de bi malbatî hatiye Qereyaziyê û gundê Gopala bi cih bûye. Ji ber vê yekê jî gotinê "Resoyê Gopala".

Di sala 1930 an 1932yan bi sedan malbat ji ciyê xwe hatine koçberkirin. Li gorî hin çavkaniyan Reso bixwe jî serhildêr bûye.[2] Lê ev mijar ne zelal e. Piştî Serhildana Agiriyê, Reso diçe aliyê Mûşê û gundeki Bilanixê (Kopê) bi cih dibe. Li wir herî zêde parlementerê Mûşê yê berê Giyaseddîn Emre, li Reso xwedî derdikeve. Jiyana Reso di nava tinebûnê de derbas dibe. Di sala 1983an de diçe ser dilovaniya xwe. Qebra wî li gundê Pagê yê Mûşê ye.

Reso bi taybetî kilamên "şer û mêraniyê" gotine. Stranên îro ku li ser serhildana Agiriyê, komkujiya Geliyê Zîlan û li ser qaçaxên (serhildêr) wê demê (mînak, Seyîdxan, Elîcan, Ferzende) ne, wî go-

1 Min ev hevpeyvîn, di 17yê meha gulanê sala 2013 de bi rêya telefonê çêkir.
2 Yılmaz Çamlıbel, *Gilîdax Bêxwedî Nîn e!*, Weşanên Deng, Stenbol, 2005, r. 209.



Scanned by CamScanner

tine. Reso bixwe Pismamê dengbêj Şakiro ye. Bandoreke mezin li ser Şakiro çêdike. Kilamên Evdalê Zeynikê ferî Şakiro dike.

Li gorî Ahmed Aras, di sala 1957an de lêkolînerekî ji rojhilata Kurdistanê tê cem Reso û dengê Reso (hemû stranên wî û yên ku ji Evdalê Zeynikê girtine) qeydê bandeke 1700 metre dike.[1] Dibêjin ku Reso bi vî lêkolînerî re wesiyeta xwe dike û dibêje ku "Heta rojekê televîzyon û radyoyê kurdan çê nebin tu dengê min neweşinî!"

## 2.5.Dengbêj Şakiro

Navê wî Şakir Deniz e. Di nav kurdan de wek "Dengbêj Şakiro" an jî "Şakirê Bedîhê Mihê Zilî" tê naskirin. Şakiro di sala 1936an de Elejgira Agiriyê ji dayîk bûye. Lê bi eslê xwe ji devera Panosê ye. Malbata Şakiro demekê li gundê Cemalwêrdiyê dijî. Navê bavê wî Bedîh e. Bedîh bixwe ji Eşîra Zilî ye ku ev eşîr jî milekî eşîra Bekiran e. Vê mijarê birayê Şakir, Seîd Deniz jî erê dike. Dema ku min ev xebat amade dikir, min bi Seîd Deniz re jî hevpeyvinek çêkir.[2] Malbata Şakiro demekê li Çiyayê Elegezê dijî. Dema ku Şoreşa Ûris a Oktoberê pêk tê malbata Şakir derbasî Serheda Tirkiyê dibe. Malbat demekê li Qereyaziyê dijî. Di sala 1959an de bavê Şakiro Bedîh tê mişextkirin, wî dişînin Edenê.[3] Şakir li Edenê jinekê direvîne. Li ser vê yekê dîsa vedigere Serhedê. Li vir dost û hevalê wî yê herî nêz Dengbêj Reso bû ku bi temenê xwe ji Şakiro pir mezintir bû û Şakir jê re digot "Apê Resûl".

Xwendin û nivîsîna Şakiro tinebûye lê dibêjin ku wî di serê xwe de bi dehan stran çê dikirin. Terza wî terza Reso û Evdalê Zeynikê bû. Şakir hem kilamên şer û mêrxasiyê, hem jî kilamên evîniyê gotine. Di jiyana xwe de sê caran zewiciye û sê zarokên wî çê bûne. Demekê jiyana wî di nava tinebûnê de derbas bûye. Di Sala 1990î de koç dike û li bajarê Îzmirê bi cih dibe. Li wir ji ber nexweşiya mîdê (bi gotina birayê wî Seîd) di sala 1996an de wefat dike. Gora wî li Îzmirê ye. Li ser gora wî bi zimanê tirkî "Doğu Şairi Şakir Deniz"

1 Heman hevpeyvîna ku min bi Ehmed Eras re çê kiriye.
2 Min ev hevpeyvîn di 25ê adara 2013yan de çêkir.
3 Mahmut Beğik, "Şakiro (1936-1996)", *Kovarabîr*, 30 Ağustos 2012.



Scanned by CamScanner

(Helbestvanê Rojhilat Şakir Deniz) dinivîse.

Şakiro şagirdê Reso ye. Ji Reso pir stran girtine. Dibêjin ku dîwana ku Reso tê de bûya heta ji Reso îzin nexwesta Şakir hemberî Reso stran nedigotin. Dengê wî bi bandan li çar aliyê Kurdistanê belav dibe. Dema ku bandên wî li Rojhilatê Kurdistan, di nav eşîrên kurmancîaxêv (eşîra Şikakiyan, Milanan, Heyderan, Hesenan) de belav dibin û pir tên guhdarîkirin, ew ji Şakir re dibêjin "Kewê Ribat". Ji ber ku Kewê Ribat kewekî nêr bûye û dengê wî bi meqamekî lîrîk bûye, wan dengê Şakiro şibandiye dengê vî kewî. Du taybetiyên dengê Şakir heye, yek "lîwe lîw" a wî bi terzeke pir cuda ye ku kêm kes dikare bi meqamê wî kilaman bibêje. Ya din jî ev e ku dengê wî nehatiye pîvandin. Seîdê birayê wî digote min "ku dengê wî bipîvana, wê derketa holê ku li ser rûyê dinê tu deng wek dengê Şakir bi aheng û bi lez nebû."

Çawa ku malbata Şakiro behsê dike, piştî 12 Îlonê, di sala 1981an de Kenan Evren diçe Qereyaziyê û gazî Şakir jî dike dibêje; "Stranan bibêje lê yên li ser şerên berê (serhildana Agiriyê, Geliyê Zîlan, Ferzende, Seyîtxan) nebêje."

### 3. Kilamên Evdalê Zeynikê yên ku ji aliyê Reso û Şakiro ve Hatine Gotin

Taybetiya kilamên Evdal mirov dikare wiha bibêje ku di bingeha hemû kilamên wî de tiştên ku qewimîne hene. Mînak, rêwitî, şer, evînên ku bihîstiye, keç û bûkên ku di rêwîti û mewantiyan de dîtine, jiyana gundê xwe ya rojane û hwd. Em ê li vir kilamên wî yên ku aliyê Reso û Şakiro ve hatine gotin vekolînin. Tê zanîn ku gundiyên Serhedê ji demên berê de bi karwanî digîhiştin hev û ji boyî debara salê diçûn bajarên wek Amed, Heleb û Erziromê. Mirov dema ku kilamên Evdal ên "qîzikan" û "Evîniyê" dinihêre, mirov dibîne ku Evdal ev kilam hemû di rewîtiyan de gotine.

## 3.1. Kilamên Evdalê Zeynikê yên ku Mijarên wan Keçik, Evînî û Serpêhatî ne ku ji aliyê Reso û Şakiro ve Hatine Gotin

Dema ku Evdal diçe Erziromê, li ser riya Erziromê gundekî bi navê Çûlya hebûye. Ji ber ku bejna Evdal kin bûye, li vî gundî qîz û bûk henekê xwe li Evdal dikin. Evdal li ser vê bûyerê straneke dibêje:

Ezê Ji Erziromê Hatim Bi Karwanî[1]
Heyla lawo, emê ji Ezurmê hatin bi karwanî
Emê peyabûne şewitiya Çulyê bi mêvanî
Qîz û bûkên Çûlyê li ser kaniyê kiras-şo danî
Ew qonaxa ku em lê peyabûn bi mêvanî
Ji bo navrojê, j ime ra xaşil danî
Wey can Evdal
Wey can Evdal
Lawo wezê hatim Çûlya şewitî cotkanî ne
Gava ji bo navrojê sifre danîne
Pêşiyê hatin qîzeke ezep û du hebê bûkîne
Li Evdal nihêrîn bi tiqe tiqe kenîne
Keçka ezep digo ev mêvana yekî kurtî kin e
Destê wî nagihije sifrê, texte û nîne
Bawer bikin ewê îro birçî bimîne
Evdal şermî dibe û xwe paş ve dikişîne
Ji qama nîro heta êvarê birçî dimîne
Bi keder û meraq êvarê ser xwe de tîne
Di dilê xwe de rica dike ji rebê jorîn e
(...)

Nebiyê Evdal, Emerê Zeynikê ev kilam bi meqamê kalikê xwe gotiye. Ji ber ku wî kalikê xwe Evdal dîtiye û pê re çend salan jiyaye. Reso jî ev kilam ji wî girtiye. Taybetiyeke tradîsyona Evdal ew e ku, dengbêjên piştî wî, tenê sozên kilamên wî negirtine, meqam û lîrîzma wî jî bi vî şekli girtine. Ji bilî van herdu dengbêjan, Kazoyê

1 Dengbêj Kawîs Milanî vê kilamê bi peyva "Evdal û Xatûn" nav dike. (S.Ulugana)



Scanned by CamScanner

Garisiya û dengbêj Heyder Berke jî ev kilam gotine. Di demên dawî de dengbêjê bi navê Kawîs Milanî jî ev kilam gotiye, lê di vê kilamê de çend peyvên nû lê zêde kiriye. Minak, Evdal ev kilam, beriya ku bûye dengbêjê Surmelî Memed Paşa gotiye, lê Kawîs Mîlanî, hevoka 'xelata ku ji Surmelî Paşa girtiye' xistiye nava vê kilamê.[1] Dibe ku Kawîs Milanî ev kilam bi tevahiya vê hevokê ve ji dengbêjekî din girtibe. Lê mixabin em nizanin ku ev dengbêj kî ye.

Rojekê Evdal diçe gundekî aliyê Tekmanê dawetekê. Li wir haya wî ji evîna keçikeke bi navê Dîlber çê dibe. Ji ber ku Dîlber û dilketiyê wê nagîhijine hev, dilketiyê Dîlberê kilaman davêje ser Dîlberê. Haya Evdal jî bi vê evînê çê dibe û ew jî li ser Dîlberê kilamekê dibêje:

*Dîlber*
Gidî heyran xaniyê bavê Dîlbera min lo ji gund tek e
Heyla kewa min yeke bejin zirav e lo enî bi deq e
Çav û biriyê delala min reş e lo reş-belek e
Herçiyê ku derdê dila dîtiye, bira loma j imin neke
Ramûsanê zer-memikê kewê ji min re teberik e

Haylê eman haylê Dîlber
Eman eman dil bi kulê Dilber
Eman eman te ez helandim lê

Gidî heyran xaniyê bavê Dilbera min lo du qanat e
Di riya navê Xudê da be îro min ne sebre lo ne tebat e
Heyla gidî heyran îro min ne bask e lo ne qanad e
Xwezî bira bigotana heramê mêrê te nehatiye
Minê bida serê xwe kolosê sipî, bihatima ba te

Haylê eman haylê Dîlber
Eman eman dil bi kulê Dilber
Eman eman te ez helandim lê
(...)

1 Hemîd Kurd, "Kawîs Milanî" 8 Berfanbar 2012, *Dicle Haber Ajansı (Diha)*, Hewlêr.



Scanned by CamScanner

Ev strana Evdal ji aliyê Reso û Şakiro ve hatiye gotin. Lê tê zanîn ku Şakir, meqamê vê stranê hinek guhartiye. Şakir ji Reso cudatir peyva "Eman" ê pir dirêj dike.

Ewdal dîsa rojekê bi tevî gundiyan bi karwanî diçe Diyarbekirê. Di vê rewîtiyê de li Zozanên Silo rastî keçikeke pir xweşik tê û di heman demê de dest bi kilamekê dike:

*Hayê Li Min*
Hayê li min hayê dilo
Minê li dîharê Zozanê Silê
Şalûr hat bû mêvanê gulê
Ji sibê heta êvarê tew tew dikir
Bi danzdeh awaza digo, lebê belê
Awirê çavên vê terezê, terezbavê
Fenanî topek ji topên Kurd Elo Paşa
Meriv dayine Çiyayê Qerejdaxê
Bigrê bavê birca vê Mûsilê
Xûdê meriva neke tora te sêrbazê, te gawurê
Mina bi gulla topê birîndar be
Ji sibê heta êvarê ji ber birîna xwe bidile
Heyla hayê li min hayê dilo
Heyla hayê li min hayê weylo
Heyla dilo tu bi şevê rojê digirî çima qe nawestî
Minanî qulingê Serhedê ji refê xwe qetiyayî
Serê baskê te bi çamûr e,koka baskê te şikestî
Ezê îro dikim herim zozanê mala bavê muhuba xwe
Gelî gundîno ez nezanim ez xerîb im
Nizanim zozanê mala bavê delalya min
Maye kîjan alî kîjan deştî
Heyla hayê li min hayê dilo
Heyla hayê li min hayê weylo

Vê kilama Evdal bi terzeke cuda Şakiro jî dibêje. Lê bi meqamê Evdal, nebiyê wî Emerê Zeynikê dibêje.

Ehmed Aras dibêje ku li devera Elbexê (Çaldiran) axayekî bi navê Evdal hebûye. Ev axa pir zilimkar bûye. Axayê hemberî xwe yê bi



Scanned by CamScanner

navê Sincarê Talo têk dibe û wî dîl digire. Dergîstiya Sincar, li ser vê yekê diçe cem Evdal Axa û ji boyî berdana Sincar, ji Evdal Axa lawa dike. Lê di vir de şaşitiyek heye ku di naveroka kilamê de jî derbas dibe. Çemê Payê li devera Geliyê Zîlan e. Evdal Axa ji axayê eşîra Mikaîlan e. Ev eşîr li çend gundên Geliyê Zîlan belav bûne. Li gorî malbata Evdal Axa,[1] Sincarê Talo kurdekî Êzidî bûye. Evdal Axa paşê Sincarê Talo dide xatirê dergîstiya wî û berdide.

Ev kilama Evdalê Zeynikê bi taybetî ji aliyê Reso ve hatiye gotin. Naveroka kilamê pir dişibe naveroka kilama Derwêşê Evdî:

*Sincarê Talo*
Haydê Evdêl, Evdêl, Evvêl, Evdêl
Evdêl ez bi qurban hive hiv e bi ron e
Çira konê reşê Ereb î ji êvar de dişxule
Ez rebena Xudê nizanim mûm û meş'el e
Nizanim fener e yan jî find û don e
Evdal î ji mala Evdêlo, tu Xûdê dihebînî
Qeyd û zincîrê te giranin
Sincarê Talo bide xatirê min rebenê
Lingê min qerimîn ji çûyîn û hatinê
Çavên min kor bûne
Destê min êvar da qerimî li ser şirîta kon û derî
Lo yemaan
Lo yeman yeman lo yeman
Li dinyayê bi sed yeman
Hayde Evdêêêl... Evdêl Evdêl Evdêêêl
Evdêl di ber me ra dikişe Çemê Payê lem e lem e
De tu izna min bide, ezê îro herim dîtina Sincarê Talo
Bi maqûmî bi letifî ez pepûkê gavekî rûnêm li cem e
Heylê Evdalî jiMala Evdêlo, qeyd û zincîrê te giran in
Sincarê Talo bide xatirê mi reben
Min û Sincarê Talo tev sirgûnke
Alikî me Rom e yek Ûris e yek Ecem e

1 Min li gundê Erdîşê yê bi navê Qizilkilîsê (İşbaşı Köyü) bi Mislim Bozkurt re (bixwe nebîçirçirkê Evdal Axa ye) hevpeyvînek çêkir. Gulan 2012. (S. Ulugana)



Scanned by CamScanner

Di serî de jî me got dema ku begên kurd ên derdora Serhedê dibihîsin ku Evdal bûye dengbêjê Surmelî Memed Paşa, dengbêjên xwe (ji bo têkbirina Evdal) dişînin dîwana Surmelî Memed Paşa. Yek ji van jî dengbêjê Terxan Axayê Qeleniyê yê bi navê Şêx Silê ye. Evdal û Şêx Silê bi rojan davêjine ber hev û Evdal, Şêx Silê têk dibe. Strana ku Evdal û Şêx Silê davêjine berhev ya ku tê zanîn hem ji aliyê Şakiro, hem ji aliyê Reso ve hatiye gotin:

*Evdal û Şêx Silê*
Lo yeman lo yeman lo lo yeman
Lo yeman lo yeman lo lo yeman
Evdal go Şêx Silê Didem e ji dilê mi ra xweş Didem e
Çemê Didemê di ber me ra dikişe lem e lem e
Minê li Tirkiyê sê wilayeta li pişt xwe hiştiye
Ezê ji bona Şêx Silê hatime welatê Ecem e
Lo yemaaan
Lo yeman lo welato
Lo yeman lo yeman lo lo yeman
Lo yeman lo yeman lo lo yeman

Şêx Silê go Evdal ku ez heme ez Şêx Silê me
Dengbêjê Tarxanê Qelenyê me
Ez kela li deştê me mija li rûyê behrê me
Li dunyayê ez beloqa ber çavê dengbêjê xelkê me
Li vira ez îro qesasê serê Evdalê Zeynikê me

Lo yemaaan
Lo yeman lo welato
Lo yeman lo yeman lo lo yeman
Lo yeman lo yeman lo lo yeman
(...)

Dibêjin ku piştî heft roj û heft şevan dengê Şêx Silê dikeve û têk diçe. Lê tê zanîn ku tu dengbêjî weke Şêx Silê li hemberî Evdal ber xwe nedaye.

Dema ku Surmelî Memed Paşa li ser fermana Siltanê Osmani-



Scanned by CamScanner

yan, bi şervanên kurd re dikeve rê ku here Xozanê, di Dêrsimê re jî derbas dibe. Ji ber ku Evdal, dengbêjê Paşa ye ew ji bi wan re rêwî bûye. Evdal dema ku di Dêrsimê re derbas dibe, kilamekê davêje li ser çend bedewên Dêrsimê jî. Ev kilama Evdal, bi taybetî tenê ji aliyê Şakiro ve hatiye gotin. Di sala 2008an de hunermenda kurd Rojdayê ev strana Evdal a ku bi avayê Şakiro, hilda albûma xwe û bi destkariyeke teknikî bi Şakiro re duetek pêk anî:

Dilêm loy lo dilêm loylo
Dilêm lo lo Dersimê xweş Dersimê
Avên çeman û kanyan tên ser me da gime gime
Lu zime zime
Ezê li Dersima jêrin rasti sê zerya hatime
Yeka tirke yeka kurmance yeka ecem e
Bextê we da me birano, wana bi avirê ava ez kuştime
Dilêm lo lo dilêm lo lo
Dilêm lo lo dilêm yar yar

Minê bala xwe berdayê, yanga jê di tirke
Cotek kondirê intabê di linga da, di ber mi ra difirike
Sol u mesê wê teresê ters bavê di linga da, di çirk e çirk e
Des dav je dêmê reş gulya, di ser milanda wer dike
Ezê dikim ramusaneki li xala gerdenê kerem kim
Nizam çima bi mira xiyal u xem e, bi kin u rike
Dilêm lo lo,
Dilêm lo lo
Dilêm lo lo, dilêm yar yar

Ezê bi sura sibêra çume cem yanga eceme
Yeke bejin zirave navik qendile, bi xiyal u xeme
Minê bala xwe dayê, di ser me da gure gur u leme leme
Mi di teres bavê ji weda tê qutya derd u kula tev li ceme
Ezê dikim ramusaneki li xala gerdenê kerem kim
Nizam çima bi mira xiyal u xem e, bi kin u rike...

Dilêm lo lo,



Scanned by CamScanner

Dilêm lo lo
Dilêm lo lo, dilêm yar yar
(...)

Di jiyana Evdal de tiştê herî zêde tê zanîn (ku di dawiya emrê xwe de çavên wî kor dibin di wan rojên tarî de) qulinga wî ya baskşikestî ye. Temoyê kurê wî diçe biniya gund û wê qulinga baskşikestî ji bavê xwe re tîne. Evdal demekê di mêrgan de dengên çûk û mozan û dengê bayê guhdar dikir û teqlît dikir. Hevaltiya Evdal û qulingê bi serfirazî, heta çavên Evdal û baskê qulingê qenc dibin didome. Li Serhedê tu kes tine ku vê çîrokê nizanibe. Kilama Evdal a ku avêtiye ser qulingê bi taybetî ji aliyê Şakiro ve tê gotin:

*Qulingo*
De lo lo de yo yooo
De yo yo qulingooo
Lo qulingo malxirabo li serê me ha meke fenanî te nîne
Baskê xwe veneke çeplê xwe di ser mi da nehejîne
Serê baskê te bi çamûr in kokê baskê te şikestîne
Tu ji derdê dilê xwe ra nebê ji birîna dilê mi ra neqinqîne
Her sê mehê havînê cih û meskenê te Serhed e
Tev mêrg û çîmen e bi gul û çîçek û çavkanî ne
Her sê mehê zivistanê sekna te qoce Mêrdîn e
Tu bi felekê bawer nebe
Her çar rojê dinyaligê weke hevdû nîne
Helek bavê kesî nîne
Çira kesî ji êvarê hetanî mila şebeqê naşxulîne
Bi kesî re her tim madûmîne
De tu rabe ji derdê dilê xwe ra bêje
Ji birîna dilê mi ra biqinqîne

Hayê li min hayê dilo
Hayê li min hayê gundo
(...)
Ez sewdalî me hayê dilo



Scanned by CamScanner

Dema ku Evdal kal dibe û Surmelî Memed Paşa dimire, rewşa Evdal pir xirab dibe û xizan dikeve. Gundên derdorê êdî wekî berê qedrê Evdal nagirin. Evdal ji ber vê yekê ber xwe dikeve û bi stranî gazinê xwe ji kurê xwe Temo re dike. Vê kilamê bi tenê Reso dibêje:

*Heyla Wayê Hey Dunyayê*
Temo lawo îro dilê mi şewitî li halê mi giriya
Lo lawo hela bala xwe bidê ronî ji ber çavê mi biriya
Wextê ku ez bi Surmelî Memed Paşa ra çûme Xozanê
Bira Rebê Alemê emanetê xwe ji min bistanda
Gava ku koka egîtan û urfîta l ime qeliya
Bavê te di dawiya emrê xwe da mîna peza guragirtî
Ji nefyê xwe qetya û maye li dû bira û keriya

Heyla wayê heyla wayê
Heyla wayê hey dunyayê

Lawo bavê te mîna qulingê nîsanê ji halê xwe ra digo û digiriya
Çiqas rewiyê ku li serê rêya hebûn ku çav bi halê mi ketin
Temama rêya xwe hîşt li mi vegeriya
Digotin apo, gotinên te ne gotinên însanên vê dewrê ye
Hey malmîrato ne te agir berda cigera me heliya
Lawo min dîsa mînanî berê qesta nava cimaetê kir
Lawên nekesa rabûne ser xwe gotin apo ciyê te ew nîne
Ez şûnda vegerim li hewliya poxana sekinîm li ser darê piya

Heyla wayê heyla wayê
Heyla wayê hey dunyayê
(...)

Piştî ku Evdal xizan dibe, ji gundê Qanciya mala xwe bar dike û berê xwe dide devereke din. Tê zanîn ku di vê navberê de pir zehmetiyan dikişîne û tevê malbata xwe birçî dimîne. Dema ku li gundan digere, gundî, Evdal wek mirovekî parsek dizanin. Ji ber vê yekê Evdal her tim diqehire. Dawiya vê koçberiyê Evdal diçe gundê



Scanned by CamScanner

bi navê Dedewêranê û li wir cih dibe. Ew gundekî eşîra Zirkiyan bû û di bin destê Qulîxan Beg de bûye. Dema ku haya Qulîxan Beg bi hatina Evdal dibe, wî çend rojan dike mêvanê xwe. Evdal du salan li wir dimîne. Her tim ku dibîne, gundî derheqê wî de xeber didin, îdare nake û dîsa vedigere gundê xwe yê berê Qanciya. Dema ku Evdal biryara zivirandina Qanciya dide, Qulixan Beg wî bi xelata çend zêran û gayekî bi rê dike. Li ser vê vexêrkirinê Evdal kilamekê dibêje. Ev kilam dîsa bi taybetî ji aliyê Reso ve hatiye gotin:

*Rabe Rabe*
De rabe rabe rabe de rabe
Rabe lawiko bala xwe bide qirrê xwe avêtiye serê çiya
Havîn e zer bûye gihayê mêrga îro li mi mirçiqî avê çavkaniya
Murada şewitiya ku dema biharê din û har bû
Mînanî însanê sêzde û çarde salî
Rê nedida rêwiya keleka û gemiya
Payîz e tenik bûye felek mala te mîrat be
Mînanî însanê ku emrê wî derbas bûye
Êdî xwe nade kapê di xam canûya
Te dilê mi li dunyayê gelek şa kir te ez xapandim
Gava mi derê cimaeta vedikir gişka digo keremke were jorê
(...)

## 3.2.Kilamên Evdalê Zeynikê yên ku Mijarên wan Şer û Mêrxasî ne Ku ji aliyê Reso û Şakiro ve Hatine Gotin

Evdalê Zeynikê li ser şerên Surmelî Memed Paşa û şerên ku li wê havirdorê qewimîne jî gelek kilam gotine. Dema ku mirov piştî Evdal lê dinhêre tê dîtin ku bi taybetî Reso û Şakiro çîrokên şerên kurdan bi stranî heta îro anîne. Tê gotin ku şervanên kurd ên ku çûbûn Xozanê, bi nexweşiya koleravê dikevin û piraniya wan li wir ji ber vê nexweşiyê dimirin. Ji van şervanan tenê nêzî çil kesî xilas dibin. Li ser vê bûyerê Evdal kilamekê dibêje. Îro çend cureyên vê kilamê tên gotin. Ev kilam li Bakur taybetî ji aliyê Reso ve hatiye gotin. Wekî din, di nav kurdên Sovyeta Berê de jî, ji aliyê Şeroyê



Scanned by CamScanner

Biro ve bi cureyekî din hatiye gotin.

*Wey Xozanê*
Weyla vê Xozanê lê lê lê li me yan da
Heyla min di simbêla reşe palik bada
Eyşan Xanimê digo Memed Paşa mı ji ter a nego berê xê nede Xozanê
Ji serê sibê hetanî nîvro sêsid xortê eşîrê li ser piştê hespa can û rih da
Dilêm yar yar dilêm yar yar
Dilêm yar yar wey Xozanê
Vê xopana Xozanê bişewite li devê dalê
Bayê samê aniye qira siyara mîna qira salê
Eyşan Xanimê digo Memed Paşa tu berê xwe nede Xozanê
Çarsid siyarê kut e bire Xozanê jê heftê hebvegeriya malê
Dilêm yar yar dilêm yar yar
Dilêm yar yar wey Xozanê
(...)

Guhartoyeke vê kilamê ya ku ji aliyê Şeroyê Biro û Reşîdê Baso ve tê gotin, bi navê "Qeymezê Êzidî" ye. Di naveroka kilamê de navê Qeymezê Êzidî derbas dibe. Paşê dengbêjên kurd ên Misilman, peyva "Qeymezê Êzdî" guhartine û kirine "Qeymezê Kurmanc."

Di sala 1885-1890î de Tahir Begê Qeleniyê li hemberî şahê Îranê serî hildide. Tê zanîn ku Tahir Beg, bi alîkariya Eşîra Heyderan bi sedan leşkerê Şah dikuje. Lê paşê çend eşîrên kurdan piştgiriya şah dikin û bi vî rengî leşkerên şah, Tahir Beg têk dibin.[1] Ev stran bi taybetî ji aliyê Reso ve hatiye gotin:

Ezê Bi Diharê Qeleniyê Diketim
Ay dê lo looo
De lo lo de lo lo ez birîndarim biranooo

1 Lord Curzon, *İran*, Weşanên Umumî Harb Dairesi Başkanlığı (Genelkurmay Başkanlığı), Ankara, 1928,.r. 98. Ev pirtûk ji aliyê dîplomatê îngiliz ê bi navê Lord Curzon ve di sala 1892yan de li Londonê bi zimanê îngilizî çap bûye. Paşê bi tîpên erebî wergera wê ya tirkî çap bûye. (Sedat Ulugana)



Scanned by CamScanner

Dayê rebenê ezê bi diharê Qelenyê diketim îro şerê Tarxanê
Biran ca rabin sêr bikin
Li çiyayê Qelenyê Tarxan bi sê denga li Emerxan kire gazî
Go bavê bavê mino hêla konanî jêr bernede
Şahê Ecem bira bi eskerê xwe nebe guman e
Nebê eskerê min giran e
Yeqîn bizanibe qetla Şahê Ecem
Li cem birayê te mina qetla du mirîşka ne
Ez çi bikim ji êxbala min ra li pêşya Şahê Ecem
Ji êvarda ketiye pêsîra me koma Celaliyan e

Lo lo lo lo lo looo
De lo lo lo lo looo
Liminê lo lo looo
Ax ez birîndarim biranooo

## Encam

Di çarçoveya vê vekolînê de piştrast bû ku 29 kilamên Evdal gihiştine roja me. Dengbêj Ebdo, Kawîs Milanî, Feqyê Qizqapanê, Emerê Zeynikê, Mihemedê Zibêd, Pêroyê Têxûtê, Zibêdê Qirka, Mistefayê Çiftborî, Şeroyê Biro, Hecî Sêvdînê Remedana, Soska Simo, Zibêdê Emo, Karabêtê Xaço, Kazoyê Garisya, Mihemedê Canşa, Evdilrehmanê Milazgirê, Zahiro, Sadiqoyê Qirimqayê, Sidîqo, Mexsûdê Hemzika, Dengbêj Ewrehmanê Panosê, Keremê Kor, Mistefayê Xelê Heyran bi meqamê Evdal strane. Ji van 29 stranan (Ez ê ji Erzurumê Hatim bi Karwanî, Dîlber, Şêx Ronî, Hayê li Min, Evdal û Gulê, Lo Mîro, Lo Axçîk Canê, Sincarê Talo, Ez ji Teyra Teyrekî Hûrim, Evdal û Şêx Silê, Minê li Hafa Nexşê Nexşiwanê, Heyla Wayê Heyla Wayê, Dersim e Xweş Dersim e, Wey Xozanê, Heyla Wayê Mîrê Zirav, Evla Begê Mîrê Zirav, Hekîmo, Evdal Kor e, Qulingo, Wey Kaliyê Wey Koriyê, Evdal Kor e Rê Nabîne, Eyşo Rabe Çirê Vêxe, Ezê bi Diharê Qeleniyê Diketim, Rojê Diçû Qolibaba de welgeriya, Temo Lewo Îro Dilê Min Şewitî, Qonaxa Bavê Te Quli ye,



Scanned by CamScanner

Temo Lewo Kulî Xweş e, Rabe Rabe, Haylê Metê) 18 heb taybeti ji aliyê van dengbêjan ve hatine gotin. Ji van stranan 11 heb jî, ji aliyê Reso û Şakiro ve hatine gotin. Şakiro ji 3 stranên Evdal ên bi navên "Hayê Li Min", "Dersim e Xweş Dersim e", "Qulingo" bi awazê Evdal gotine. Reso jî 6 stranên wî yên bi navên "Ezê ji Erzurumê Hatim bi Kawranî", "Sincarê Talo", "Heyla Wayê Heyla Wayê", "Rabe Rabe", "Wey Xozanê", "Ezê bi Diharê Qeleniyê Diketim" gotine. Stranên Evdal ên bi navên "Dîlber", "Evdal û Şêx Silê" hem ji aliyê Reso, hem ji aliyê Şakiro ve hatine gotin. Lê tê zanîn hemû stranên Evdalê Zeynikê ji aliyê Ferzê û nebiyê Evdal Emerê Zeynikê ve hatine gotin. Piraniya mijarên van stranan ji serpêhatiyên Evdal (dîtina keçik û bûkan, rêwitiyên gundên havirdorê) pêk tên. Stranên Evdal ên şeran pir kêm in. Ev jî taybetiyek e. Di dawiyê de em dikarin bibêjin ku Gulê, Ferzê, Reso û Şakiro wek çar duajoyên Evdal, tradisyona wî domandine û heta salên 1980-1990î anîne. Îro jî dengbêjên wek Kawîs Milanî û Zahiro, Dengbêj Cesîm û Dengbêj Kemal Încesû dikin ku terza Evdalê Zeynikê bidomînin. Bê guman ev jî mijara gotareke din e.

**Çavkanî**

**Pirtûk, Kovar, Malperên Înternetê û Rojname**


Aras Ehmed, *Şairê Kurda Yê Efsanevî Evdalê Zeynikê*, Weşanên Deng, Stenbol, 1996.

Aras Ehmed, *Serhildana Seyîdan û Berazan (Seyîtxan, Elîcan, Fesîhê Mihê Mîrze)*, Perî, Stenbol, 2009.

Beğik Mahmut, "Şakiro (1936-1996)", *Kovarabîr*, 30 Tebax 2012.

Blau Joyce, *Contes Kurdes, ed. Flauve et Flamme*, Paris, 1986.

Celîl Celîlê, *Kürt Halk Tarihinden 13 İlginç Yaprak*, Weşanên Evrensel Basım, Stenbol, 2007.

Curzon Lord, *İran*, Weşanên Umumî Harb Dairesi Başkanlığı (Genelkurmay Başkanlığı), Ankara, 1928.

Çamlıbel Ehmed Cengîz, *Evdalê Zeynikê Hîmdarê Mekteba Stranên Serhedê*, Weşanên Deng, Amed, 2005.

Çamlıbel Yılmaz, *Gilîdax Bêxwedî Nîn e!*, Weşanên Deng, Stenbol, 2005.




Scanned by CamScanner

Gündüz Bülent, "Evdalê Zeynikê Anıt Mezarı ve Kültür Sanat Festivali", *Yeni Özgür Politika*, 25 Pûşber 2012.

Kevirbirî Salih,"Kuştina 'Teyrê Ser Milê Qîz û Bûkan' Dengbêj Ferzê", *Bîrnebûn*, j.15., 2002.

Kurd Hemîd, "Kawîs Milanî", *Dicle Haber Ajansı (Diha)*, Hewlêr, 8 Berfanbar 2012.

Nikitin Bazil, *Kürtler*, Weşanên Özgürlük Yolu,1986.

Parıltı Abidin, *Dengbêjler-Sözün Yazgısı*, Weşanên İthaki, Stenbol, 2006.

Süphandağ Kemal, *Ağrı Direnişi ve Haydaranlılar*, Weşanên Fırat, Stenbol, 2006.

Ulugana Sedat, Mermer Gülay, "Kozanoğulları Kürt Beyliği ve Sürmeli Mehmet Paşa", *Kovara Mizgîn*, Tebax 2009.

Uzun Mehmed, *Dengbêjlerim*, Weşanên İthaki, Stenbol, 2006.

**Hevpeyvîn**

Aras Ehmed, 17 Gulan 2013

Bozkûrt Mislim, 12 Gulan 2012

Denîz Seîd, 25 Adar 2013

Guler Ebdilkerim 21 Tîrmeh 2013

Band (Kaset)

Bandên Dengbêj Reso

Bandên Dengbêj Şakiro

Bandên Dengbêj Keremê Kor

Bandên Dengbêj Ewrehmanê Panosê



Scanned by CamScanner